© Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîroz, Moskva 2011

# NE'MA YÛH'ENNAYE DUDA

## Pêşgotin

Yûh'enna vê ne'ma xweda xwe çawa «berpirsîyarê civînê[f]» h'esab dike û vê ne'mê wê «xanima bijartî û zar'êd wêr'a» dinivîse, ku hinek fe'm dikin çawa civînek û endemêd wê.

Fikira ne'mêye sereke ew e, ku bawermend nava r'astîyêda bimînin û hevdu h'iz bikin. Bona dersdarêd şaş jî dibêje, ku bawermend h'evza xwe ji wan bikin, bona k'îjana ne'ma pêşinda bîr anîye, yêd ku hînkirinêd şaş bela dikin.

### Serecema fikira ne'mê

Pêşgotin (1-3)
H'izkirin ser her t'emîyar'a be (4-6)
H'evza xwe ji dersdarêd şaşe derew bikin (7-11)
Paşgotin (12-13)

### Silavkirin

**1** [1] Ji berpirsîyarê civînê[f],
Xanima bijartî û zar'êd
wêr'a, k'îjana ku ez bi r'astîyê
h'iz dikim, ne ku t'enê ez, lê ew
h'emû jî, yêd ku r'astîyê nas di-
kin, [2] çimkî ew r'astî nava meda
dimîne û h'eta-h'etayê wê t'evî
me be. [3] De bira r'e'm, k'erem[f]
û e'dilayî ji Bav[f] Xwedê û Îsa
Mesîhê* Kur'ê Bavê, bi r'astîyê
û h'izkirin mer'a** be.

### R'astî û h'izkirin

[4] Ez p'ir' şa bûm, ku min ji za-
r'êd te hinek dîtin, yêd ku nava
r'astîyêda dijîn, li gora wê t'emîya

---

* 1:3 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Xudan[f] Îsa Mesîh».

** 1:3 Nav hinek destnivîsarada dewsa «mer'a» «wer'a» heye.

ku me ji Bavê standîye. 5 Niha
ez hîvî ji te dikim, Xanimê, ez
t’emîke nû ter’a nanivîsim, lê ya
ku berê pêşda li me hebû, ku em
h’emû hevdu h’iz bikin*. 6 H’iz-
kirin ev e, ku em li gora t’emîyêd
Wî bijîn. T’emî ew e, ya ku we
hê berê pêşda bihîstîye, wekî hûn
h’izkirinêda bijîn*.
7 Gelekêd ku xelqê ji r’ê derdixin
hatine dinê, ew Îsa Mesîh bi xûn
û goşt hatî îqrar[f] nakin. Yêd aha
xelqê ji r’ê derdixin û ek’sîmesîh
in. 8 Hûn haş ji xwe hebin, wekî
hûn k’eda xwe* unda nekin, lê heqê
xwe t’emam bistînin**. 9 Her kesê
ku xwe pêşda davêje û nava hîn-
kirina Mesîhda namîne, Xwedêyê
wî t’une. Yê ku nava hînkirina
Mesîhda dimîne, bona wî Bav jî
heye, Kur’ jî heye. 10 Heger yek
bê cem we û vê hînkirinê neyne,
hûn wî qebûl nekine malêd xwe
û silavê nedine wî. 11 Çimkî k’î
silavê bide wî, ew t’evî kirêd wîye
xirab dibe.

**Silavêd axirîyê**

12 Gelek tiştêd mine nivîsarê
wer’a hene, lê min nexwest ser
k’axazê bi h’ubirê binivîsim, çimkî
gumana min heye ezê xwexa bême
cem we û r’û bi r’û t’evî we xeber
dim, wekî eşqa me t’emam be.
13 Zar’êd xûşka teye bijartî li te
silav dikin.

* 1:5 Yûh’enna 13:34; 15:12, 17.
* 1:6 Yûh’enna I, 5:3.
* 1:8 Nav hinek destnivîsarada dewsa «xwe» «me» heye.
** 1:8 Nav hinek destnivîsarada dewsa «lê heqê xwe t’emam bistînin» «lê em heqê xwe t’emam bistînin» heye.